BEYTA NISRA

Belavkirin : Bedel feqîr Hecî

Nisra keça mîr mewlaye
Xatûneke pirr hêjaye
Xo li hîvîya surrê hêlaye ……..

Nisra xatûneke pirr delale
Kire hisabê hezar sale
Axret ji xiwera kire rastemal ,
go : ev dinya puçe betale……

Mîr mewla xudanê dewletê
Nisra fikirî li hikûmetê
go: surrek dê dahir bit li rûyê vê ometê……

Nisra go ev dinya tuneye
Surek dê dahir bit wextê meye
Xoşya hingî heqê meye ……

Nisra bandiket milyaketa
Keyfa vê dinyayê li min xoş neke
Behişt heye bê şike .....

Bejin û bala wê ça şirîne
Peyva wê ji mêzîne
Dîtina wê têrbûn nîne .....

Nisra go: çi subeyek ji yêt xewleye
Min dît derwêşek hate mala meye
Go : Nisra van erkana ber nede ,
Êzîd dê dahir bit li wextê teye .....

Nisra bi kesîra ne dida cewabe
Dak u baba da cewabe
Go : ocaxa me betal nabe .....

Nisra cewab daye
Sultanek dê dahir bit pirr reng daye
Ne sed xozika wî rêya xo berdaye .....

Nisra wa didet cewaba
Guh nedene birînan u daxa
Behişt heye bîstan u baxa .....

Nisra go halê me ji halê we xoştire
Bedîla nehsed tev agire
Xozka ruha hingî bibe sere .....

Nisra xatuneke şemsanîye
Kevokeka nû ferxîye
Kulîlkeke nû bijkivîye .....

Rengê wê ji kasêye
Peyva wê ji mêzînêye
Aqilê wê ji qudretêye .....

Nisra go heqe hûn bi sebirin
şev û roja bi fekirin
Xam û enkar bi xo di demirin .....

Nisra go şîreta neken bi belaşî
Heke xiwace hatin vekirin derê qûmaşî
Xam û enkar dê mînin li paşî .....

Nisra go şîreta neken bi nezanî
Xo xelas bi ken ji vî zemanî
Ezim fedawîya wî sultanî .....

Ew sultanê em çêkirîn
Berî Adem dahir kirîn

Kî dizanit çawa em dayin ,
çawa em birîn ……

Ew Ademê me dîtîye
Hêvênê me yî batinîye
Eslê me yî fedawîye ……

Ew kî bu pişti Adem axî bû
Bi şola Xudê ney razî bû
Hêvênê me ji behra sipî bû ……

Wextê me dît pêla veda
Av xewidî mewca li meda
Sebra me têt bi kanîyêt zelal ……

Kanîyêt zelal bi sitirînin
Avêt xewidî tam tê nînin
Heke tavê da wê çikînin ……

Ji malê heram ne hesidin
Destêt wan wekî agirin
Birînêt wan ji yêt we kurtirin ……

Birînêt wan derman nabin
Ev dinya dê jê rabin
Dê di hebsêt tarîda hindabin ……

Ez çi bikem ez ne mêrim
Ez hevalêt xo di hijmêrim
Da bi fehim u aqil bi fikirim .....

Ez li hatinê fikirîm
Li ser hevalêt xo di girîm
Bedîl bihorîn û betilîn .....

Hevalêt min horîyêt delal
Runiştin li ser kanîyêt zelal
Wê di îsîyên weke find û şemal .....

Xozî ez mêrek bame bi dil û ceger
Min helgirtiba şîr û xencer
Da ez bame fedawîyê dura zer .....

Xozî ez mêrek bame ney ticare
Ne bi zêr û mal ney beqale
Da min kuştibane qetil helale .....

Xozî ez derwêşek bame yî xilmet kare
Da min ebadet kiriba li hedê sala
Da gehiştibame wan hevala .....

Xozî ez mêrek bame yî ciwamêr
Xudê malek daba min têr
Da min hevalêt xo kirrîbane bi mal û zêr

……

Ez biqurbanîya wî heyranî
Dil û gelba min di zanî
Da em runêyin li dîwana wî sultanî ……

Ew sultane yî mezine
Hukim û hekamet da destê dujmine
Ew dizanit kî fedawîye û kî êmine ……

Ewan di got sultan Êzîd nayê
Sen'et çêkir agir dayê
Cimhûrîye û palek dayê ……

Kerem rakir
Sin'et karkir
Çûyê ji me bawer naken ,
Dora weye xo xelas ken ……

Heke tû êkî dibînî
Hola te ye tû jê helînî
Li meyla dinê pê ne hesînî ……

Piris ne ke li hemû kese
Heke yî aşiqe ji xora bese
Heke yî fedawîye dê li te pirse ……

Heke tu aşiqî bi sebire
Bi şev û roj bi fekire
Xam û enkar bi xo di demire .....

Li hemlê îmanê rabin
Ji xam û enkara cudabin
Hincîyê xiwarî dê cezabin.....

Heke êkî divêt te bişkênîne
Tû xilmeta şêşimis dikey xo me tirsîne
Bela di zavin şêşimis dê jêra îne .....

Bela dizavin şêşimis dê li wan kar ket
Navê wan dê dinav kuştîya ket
Agir heye dê li wan bela ket .....

Ewan di vêt vî agirî bi temînin
Li ba hev runên da bi tefînin
Emrê jore na tefînin .....

Agir hilbû kefte şerqê
Pêt bilind bû kefte xerbê
Telpê fexir hate herbê .....

Hindek hene xudan xofa ji xora di kene ber bere
Ew nikarin serê xo rakin ji ber bê bexit û nebû kere

Ew di bê behrin li herdû sere .....

Gelek hene xo xurt diken
Ew nikarin eşîret û mileta qan' biken
Ew bira û bira ji hev diken ... ...

Gelek hene xo di kene axa
Di bê sîqalin na meşin saxe
Herba giran dê li wan rabe .....

Xozî bihata ew dem û ew hîwan
Heqî û rastî dê ba temam
Temamtîya vî qewlî li navê şeşimis û xudan
.....

Ev beyte min dubare bi şêwekî rêk û pêk û serrastkirî lişeva 1/ 2 /2005 li gundê Ba'edrê ji cem ruhanîyê Êzidîya pêşîmamê şerfedîn (Nu'man Elyas) daye nivîsîn , hejîye bêjîn ku berî hingî bi du roja ewî bi destxeta xo ji minra li gel berêz kak Hesen Êsîyanî şandibû , supasîya wan dikem.